

PAPER DETAILS

TITLE: Danasîna Dîwana Mehwî

AUTHORS: Hemin Omar Ahmad

PAGES: 140-144

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/392538>

DANASÎNA DÎWANA MEHWÎ

Hemin OMAR AHMAD¹

Kurtejîyana Mehwî

Navê wî Mela Muhemmed kurê Mela ‘Usmanê Balixî ye. Nasnavê wî Mehwî ye. Di helbesteke wî de nasnavê wî Meşwî² bûye. Paşê hingê wî bi xwe kiriye Mehwî. Wateya wê nemabûn, mehûbûn e. Balix gundek e, li devera Mawetê, li derdora bajarê Silêmanîyê ye. Li ser dîroka jidayîkbûna Mehwî boçûnên ji hev cuda hene. Gelek lêkolineran li ser vê babetê raman û şîroveyên xwe weşandine. Bi gelempêr dîyar e ku Mehwî di sala 1831’ê mîladî li gundê Balixê hatiye dinyayê. Bavê wî xelîfeyê Şêx ‘Usmanê Sîraceddinê Tewêle³ bûye. Di heftsalîya xwe de li cem bavê xwe dest bi xwendina xwe a seretayî a ‘ilmê kiriye. Piştî hingê ji bo ku xwendina xwe berdewam bike çûye bajarê Sineyê û Sablaxê (Mehabad)⁴ li cem Mela ‘Ebdullahê Pîrebab xwendîye. Piştî hingê vegeŕiyaye Silêmanîyê û li cem hin melayên navdar ên wê demê xwendina xwe domandiye. Piştî vê, çûye Bexdayê û bûye feqîyê zanayê navdar ê Kurd Muftî Zehawî. Îcazeya melatîya xwe sala 1859’an ji Muftî Zehawî wergirtiye û li Bexdayê, di mizgefta Îmamê ‘Ezem (Ebû Henîfe) de dest bi melatîyê dike û vê xizmeta xwe heta 1862’yan berdewam dike. Piştî hingî dizîvire Silêmanîyê û li vê derê dibe endamê dadgeha Silêmanîyê.

Di sala 1868’an de ji ber sedema wefata bavê xwe dest ji kar û barêñ dewletê kêşaye. Dîsa dest bi melatîyê kiriye û dest bi dersdana feqîyan kiriye ango di cîyê bavê xwe de dest bi muderistîyê kiriye. Di vê serdemê de çend melayên navdar di medreseyâ Mehwî de perwerde bûne. Navên hin ji wan melian ev in: Mela Hesenê Qizilcî, Mela Mehmûdê Meznaweyî, Mela Se’id Efendioğlu Kerkûkî, Mela ‘Ezîzê Miftîyê Silêmanî...

1 Alk. Doç. Dr., Zanîngeha Bînglê, Beşa Ziman û Edeba Kurdî

2 Birajtî.

3 **Tewêle:** Niha gundekî ku bi ser bajarê Helepçeyê ve girêdayî ye

4 **Sine û Sablax:** Du bajarêñ Rojhilatê Kurdistanê ne.

Mehwî wekî bavê xwe di rêya terîqetê de meşîyaye û bûye xelîfeyê Şêx Behaeddînê kurê Şêx ‘Usmanê Tewêle. Şêx Muhemmedê Xal dibêje Mehwî di gel çend melayên din li Silêmanîyê di sala 1874'an de nefîyi Bexdayê bûye. Lê heta niha kes nizane ku ji ber çi ev nefî pêk hatiye. Piştî hingê dîsa dizîvire Silêmanîyê.

Li gorî boçûna ‘Elaeddîn Seccadî, Mehwî di sala 1883'yan de çûye hecê. Piştî pêkanîna erka hecê çûye Stenbolê. Li Stenbolê bi navgîniya maqûl û mezinên Kurdan ve wî Sultan ‘Ebdulhemîdê Duyem ê ‘Usmanî dîtiye. Sultan rêzeke zor lê girtiye û ferman daye ku li Silêmanîyê ji bo wî dergahek bê avakirin. Ew dergaha ku di wê serdemê de ji bo Mehwî hatibû çêkirin, hê jî heye. Mehwî di sala 1906'an de li Silêmanîyê wefat kiriye û di odehyeke dergaha xwe de hatiye definkirin.

Berhemên Wî

Dîwan

Dîwaneke mezin a Mehwî heye. Ji bilî dîwana wî tu berhemên wî nehatiye peydakirin. Dîwana wî bi sê ziman e; Kurdî, Farisi û ‘Erebî. Helbestê dîwanê piranî bi Kurdîya Soranî ne. Hejmara helbestan li gorî ziman wiha ye:

Kurdî: 201

Farisi: 105

‘Erebî: 1

Naveroka Dîwana Wî

Ji helbestê Kurdî; 132 xezel, 48 çarîn, 16 takebeyt û 5 jî qeside ne. Helbesta ‘Erebî li ser hel Besteke Zehawî texmîsek e. În Farisi; 75 xezel, 2 texmîs, 20 qit'e û 7 jî takebeyt in. Helbestê Mehwî yên Kurdî piranî dînî ne. Ji ber ku Mehwî kesayeteke tesewifi bûye, piranîya helbestê wî li ser vê babetê kom bûne.

Beşa xezelan: Mezintirin beşa dîwanê ye. Xezelên wî piranî li ser huba Îlahî, xoşewîstî û evînî ne.

Qesîdeya yekem: Navê qesîdeyê ‘Eqdul ‘Eqâide (*Gerdenbendêna Bawerîyê*) ji 136 malikan pêk hatiye. Ji alîyê qafiyeyê ve bûye çar beş. Du besêne wê li ser qafiyeya (an) û (in) hatiye ristin. Duduyê din jî li ser qafiyeya (ûn) hatiye ristin. Ji bo têgihiştin û çejjêwergirtina vê helbestê divê paşxaneyeke dîmî-‘eqidewî hebe. Ji ber ku termênu ku hatine bikaranîn piranî felsefi-dînî ne.

Qesîdeya duyem: Navê qesîdeyê “Subhan e Ew Xweda ye” ye. Ji 23 malikan pêk tê. Naveroka qesîdeyê munacat e.

Qesîdeya sêyem: Ev qesîde jî munacat e. Bi “Xedaya Îradey Munacatime” hatiye destpêkirin. qesîdeya herî kurt ev e. Mehwî vê qesîdeya xwe ji yên dîtir cuda dike, di vê de sîstema cotqafiyeyê bi kar anîye.

دیوانی مەھوی

«لا موحەممەدی کورى ۴۶ عوسمانى بالشى»

لېكدانەوە و لېكتۈنىەوە:

«لا عەبدولكەریمی مودەبریس و موحەممەدی ۴۶ كەرىم

Qesîdeya çarem:

Qesîdeya Behrî Nûr e. Ev qesîde ji helbestên navdar ên Mehwî ye. Li ser vê qesîdeyê çend helbestvanê piştî Mehwî nazîre nivîsandine. Zêdetir li ser xoşewîstîya pêxember û jîyana wî rawestîyaye. Ji 124 malikan pêk tê.

Qesîdeya pêncem: Li ser medh û stayışen Mewlana Xalidê Neqîsbendî hatiye nivîsin. Ji 24 malikan pêk tê.

Çarîn:

Hemî çarîn li ser

kêşkeke ‘erûzê nehatine nivîsin. Ji alîyê qafîyeyê jî tenê qafîyeyê rewacdar wekî (aab) û (aaaa) bi kar neanîye. Hin qafîyeyê din jî bi kar anîye, wekî (abab), (abcb)...

Her wiha behrîn arûzê yên ku di çarînan de hatine bikaranîn ev in: Hezec, remel, xefîf, muctes, muteqarib, muzari’ û besît.

Takebeyt/yekmalik: Di dîwana Mehwî de 16 yekmalikên serbixwe hene. Ev ji alîyê kêşeyê ve li ser behrîn hezec, remel muzari’, besît û recezê hatine amadekirin. Ji alîyê qafîyeyê jî du cure ne; (aa) û (ab).

Çapêن Dîwana Mehwî

- Yekem car li Silêmaniyê di sala 1922'an de ji alîyê 'Elî Kemal Bapîr ve di Çapxaneya Hikûmetê de hatiye çapkiran.
- Cara duyem di sala 1977'an de li Bexdayê, ji alîyê Mela 'Ebdulkérîm Muderrî û kurê wî Mela Muhummed Kerîm hatiye çapkiran. Di vê çapê de him tehqîqa dîwanê heye û him jî şerha dîwanê hatiye kirin. Heta niha ev xebat gelek caran hatiye çapkiran. Her wiha di vê derbarê de wekî girîngtirîn xebata dîwana Mehwî tê qebûlkiran. Me jî di xebata xwe a ferhengê de ji vê berhemê gelekî sûd wergirt.
- Dîwanî Mehwî, (edt. Arif Zêrevan) Sererastkirin: Newzad Hirorî, Weşanên Nefel, Stockholm 2007. Yekem car bi vê xebatê dîwana Mehwî hatiye latînîkirin. Lê tenê li ser internetê hatiye çapkiran. Di vê xebatê de tenê metnê dîwanê hatiye waşandin. Jîyana helbestvan, ferhengoka dîwanê, tehqîq û şerha dîwanê û h.w.d. di vê xebatê de tune ne.

'Arûz, Qafîye û Rewanbêjî di Helbestên Mehwî de

'Arûz

Wekî piranîya şâ'irên klasîk tenê kêşa 'arûzê bi kar anîye. Heşt behrên 'arûza 'Erebî (hezec, remel, xefîf, muctes, muteqarib, muzarı', besît, recez) bi kar anîye. Di asta yekê de kêşa *hezec* gelekî bi kar anîye. Herî hindik jî *recez* bi kar anîye.

Qafîye

Ji alîyê qafîyeyê ve Mehwî her 28 tîpêن 'Erebî jî bo qafîyeyê bi kar anîye. Ji bilî 28 tîpêن 'Erebî çar tîpêن Kurdî jî (ç, j, g, ê) kiriye qafîye. Bi vî awayî Mehwî bi 32 tîpan qafîye çê kiriye û dîwanike muretteeb anîye holê.

Rewanbêjî/belaxet

Mehwî muderisekî mezin bûye. Ji bilî zimanê dayikê bi 'Erebi, Farisî, Tirkî baş zanîbûye. Helbesten wî yên bi 'Erebî û Farisî jî hene. Lê di helbestên Kurdî de jî gelek term û bêje û motîfên 'Erebî, Farisî û Tirkî bi kar anîye. Xuya ye ku bêtir bandora 'Erebî li ser zimanê helbestên wî ên Kurdî heye. Di ferhengoka ku me ji bo dîwana wî amade kir de bandora 'Erebî bi awayekî vekirî eškere bûye. Mehwî termên tesewif, felsefe, mîtolojî, 'eqîde, tarîx û 'erdnîgarîyê bi awayekî zor û serkeftî bi kar anîye.

Mehwî tesewif û rewanbêjî bi hev re bi kar anîye. Ji ber vê yekê têgihiştina helbestên wî ne hêsan e. Li gorî ritma helbestê jî kêşen qurs bi kar anîye, müsîqaya wan jî ji xwîneran re ne hêsan e. Ji alîyê peyvîn ku hunera wan xurt e, Mehwî gelekî serkeftî ye. Hemû hunerên rewanbêjîyê bi kar anîye û çêjeke ruhî/me'newî tevî helbestên xwe kiriye.

Wekî rîbereki terîqetê Mehwî, di helbestên xwe de xwestiye ku terîqet bikeve xizmeta şerî'etê. Her wiha sûdeke zor ji bizava sofîgerîyê wergirtiye. Di binê bandora sofîyêne mezin de maye. Wekî Ibn 'Erebî, Hellac, Celaleddînê Romî û w.d.

Hin mijar û îmajêن sereke yên helbestên wî ev in; Şev, 'esqa îlahî, wucûd, 'edem, 'edalet, heq, çaksazîyêن civakî, pesnê zimanê Kurdî, jîyana ruhî, mirin, exlaq û w.d.

Xebatêن Li Ser Dîwanê

Bi dehan xebat li ser Dîwana Mehwî hatine kirin. Xebatêن ku li ser Mehwî hatine kirin piranî li Başûrê Kurdistanê û dîyasporayê hatine kirin. Ji dehan bêtir tez (master-doktora) li ser helbest û dîwana wî hatine amadekirin. Hin tezêن di derbarê Mehwî de ev in:

- İbrahim Ehmed Şiwan, *Şî'rê ayînî û sofîgerî Li Şî're Kurdiyekanî Mehwî da*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr 1996.
- Ehmedî Mela, *Mehwî Le Nêwan Zahîrîyet û Batinîyyet û Serçavekanî İşq*

û Wêney Maşûq De, Teza Doktorayê, Zanîngeha Sorbonê, Fransa ??

- Sebbûr ‘Ebdulkérîm, *Rengdanewey Kesêtî* û *Dunyabînî Hellac Le Şî'rî Klasîkî Kurdi* û *Farisi De, Be Taybet Lay Mehwî* û *Hafizi Şîrazî*, Teza Masterê, Bexda 2006.
- Sîrwan Cebbar Emîn, *Eş'arîyet Le Şî'rekanî Mehwî De*, Teza Masterê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr 2007.
- *Me'rîfe û Heqîqet Le Nêwan Felsefe û Îrfan Le Şî'rekanî Mehwî De*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr 2010.
- Mihemmed Tatanî, *Bûn Le Şî'rî Mehwî*, Teza Doktora, Zanîngeha Koye, Koye 2008.
- Talîb Ebûbekir Tahîr, *Felsefey Jîyan Le Şî'rê Mehwî*, Teza Masterê, Zanîngeha Silêmanîyê, Silêmanî 2011.
- Hêmin Omar Xoşnaw, *Hermonotîkay Şî'rî Sofyaney Mehwî*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Silêmanîyê, Silêmanî 2014.

Xebatê Din

- Di derbarê Mehwî di salên 80'yî de sempozyûmek hatiye lidarxistin. Paşê gotarêvê sempozyomê bi navê “Le Barêy Mehwî Lûtkewe” wekî pirtûk hatiye çapkiran.
- Di sala 1999'an de li Hewlêrê sempozyûmeke din li ser Mehwî li dar ketiye. Meqaleyêvê sempozyomê jî bi navê “Fîstîfalî Mehwî” hatiye çapkiran.
- İbrahim Ehmed Şiwan, *Mehwîname*, Weşanxaneya Minare, Hewlêr 2010.
- *Farhengî Sofyaney Dîwanê Cizîrî û Mehwî*, Weşanê Akademîya Kurdî, Hewlêr 2002.
- ‘Umer Mehwî, *Çarînekanî Mehwî*, Silêmanî 2014.
- Tehsîn Heme Xerîb, *Nûrî Hîkmet û Rohî 'Îrfanî Mehwî*, Silêmanî ?
- Abdullah Qeredaxî, *Deyrî Işıq*, 2014 Silêmanî.
- ‘Umer ‘Ezîz Mehwî, *Mıştê Le Bêjey 'Arîfi û Kirdey 'Îrfanî Mewlana Mehwî*, (4 Cild), Silêmanî 2014.
- Hîmdad Şahîn, *Mehwînasî*, Kerkûk ?
- *Gulxaneyê 'Arifan*, ?-

Ji bilî van pirtûk û xebatê akademîk çendîn têzêن din û gelek gotar jî di vê derbareyê de çap bûne.